

Ronkirina Razîbûnê jibo Pişkinîna bixwe birêka PoC (Point of Care)- lidijî Cîna

herwesa razîbûn jibo karkirin liser Zanyariyên Kesatî

1. Razîbûn jibo encamdana Pişkinîna bixwe birêka PoC -lidijî Cîna

Livêre em Razîbûna xwe Rondikîn li dûf Maddeya 1629 birka 1 Rista 2 Hs.1 ji Pertûka Yasaya hevvelatiya, ko Keça me/Kurê me

.....,ji daykbû-ya/yê

1

Li Cihê li nav Avahiyê Dibistanê hatiye diyarkirin jibo birêvebirina Pişkinîna PoC-lidijî Cîna, ko bi Rêka Pişkinîna PoC lidijî Cîna, jiber Gomana toşbûnê bi Vayrosê Koronayê-SARS-CoV-2 bixwe Pişkinînê biket. Ronkirina Razîbûnê birêveçûn û Şirovekirina Pişkinînê bixweve digirît, herwesa digelçun û çavdêrîkirin ji aliyê Kesên digel Dibistanê kardikin û pêşwext Rênmayî hatine kirin liesr vê çendê, jiberko ew karê pizîşkî dikin birengê baş bisporiya wan yahey. Herwesa bivan Kesara Mamosta û Kesên xwebexş ko Alîkarên Rêveberiyê dikin û li Senterekê Pişkinînê bi Rengekê Serekî anjî li tenişt Karê xwe karkiriye bo Nimune (Pizîşkin anjî Karmendên Komelên Xêrxwazîyêne).

Pişkinîna- PoC-lidijî Cîna ne Pişkinîneka Fermiye ji alyê Dibistanê ve dihête encamdan, lê Pişkinîneka xwebexşe û bê Pareye û xwebixwe bo Kiça hewe û Kurê hewe dihête encamdan. Zanyariyên dirust liser Pişkinînê û bitaybetî liser birêveçûna wê, hun dikarin Rênmayî û Rengê bikarîna Berhemê wê divî Adresê jêrî da:
<https://www.roche.de/patienten-betroffene/informationen-zu-krankheiten/covid-19/sars-cov-2-rapid-antigen-test-patienten-n/#anchor-handhabung>
Bidest bînin.

Encamê Pişkinîneka- lidijî Cîna ya Erênî(Positiv) çêtbît li destpêkê bes Goman bit, neko destnîşankirina toşbûnê bit bi Vayrosê SARS-CoV-2. Egerên wê çendê hene, ko li piştî Pişkinîneka- lidijî Cîna ya Erênî, Pişkinîneka PCR (kartêkirina Zincîra fireh) encamekê Nerênî (negative) hebît. Diser hindêra, eger encamê Pişkinîna PoC-lidijî Cîna yako bixwe hatiye kirin (“Pişkinîna bixwe”)Erênî bit û egerê wê çendê bidet ko Vayrosa SARS-CoV-2 berdeste, liser her Kesekî fere ko agehî jivê çendê heye, bê gîrobûn piştî zanî, agehdariya çavdêra biket û birêkeka rastewxo qesta Mala xo biket. Digel van Nama dê Zanyariyên berfreh

Wergirin eger hat û Pişkinîna lidiji Cîna Erênî derkeft.

Encamê Pişkinîna bixwe lidiji Cîna ya Nerênî, berdewam dihête hijmartin mîna Wênekê demkurt, eve dihête wê Ramanê ko ev Pişkinîne diltenahiyê êkcar nadet, ko Zarok toşî SARS-CoV-2 nebûye. Rênmayiyên paqijiyê û dûr rawestanden ji êkûdu herwesa Erkê dapuşîna Serûçava bi Maska, divêt di Encamên Pişkinîna Nerênî jida bê merc bihêne bikarînan û jê haydarbin.

Razîbûn jibo Pişkinîna bixwe bi Rêka PoC-lidijî Cîna, karekê xwebexşe û herdemekî digel guhurîna demî li dahatî hûn dikarin betal bikin. pişikdarî di pişkinîna bixwe bi Rêka PoC-lidijî Cîna jibo wê çendêye, ko Dibistanê, piştî encamdana Pişkinîna bixwe bi Rêka PoC -lidiji Cîna, Zanyariya liser Encamên Erênî yên Pişkinîna PoC lidijî Cîna wergirit.

Ev Ronkirina Razîbûnê divêt ji herdu aliya, Dayk û Baban bihête îmzakirin, eger heye ko aliyek ji Dayk û Baban nûeratiya Zarokî bitinê biket, eger Mafê çavdêriyê êkla bikarbinît, yanî Biryarê li dûf Madeya 1628 ji pertûka Yasaya Hewwelatiya jibo bidet.

.....
Cih, Rêkeft

.....
îmza Dayk û Baban yanî Qutabiyê
Jî Pêgehiştî

II. Razîbûn jibo karkirin liser Zanyariyên Kesayetî û bihevra girêdan digel beşdarîkirin di Pişkinîna bixwe bi Rêka PoC-lidijî Cîna.

Diser vê çendêra, Em Razîbûna xwe li dûf Madeya 6 birka 1 Rista 1 pîta a) herwesa Madeya 9 Rista 2 pîta a) ji Rêpênîyên Europa 2016/679 ji (parastina Nihîniya-Rêpênên Binyatî – DSGVO) jibo amadekirina Zanyariyên Kesayetî yên li jêrî yên Kiça me / Kurê me jibo destnîşankirina her toşbûnekê bi Vayrosê Koronayê SARS-CoV-2 û jibo Rêkgirtinê liber belavbûna Vayrosê Koronayê SARS-CoV-2 dideyn:

- Nav- û Paşnavê Kiça hewe / Kurê hewe ,
- Roj û Cihê ji Daykbûna Kiça hewe / Kurê hewe,

- Nav û Nîşanên Cihê akincîbûna Kiça hewe / Kurê hewe,
- Zanyarî liser birêveçûna Dibistana Kiça hewe / Kurê hewe (Dibistan, Pol, Sala Xandinê),
- Nav- û Paşnavên hewe wek Dayk û Bab,
- Nav û Nîşanên Cihê akincîbûna hewe wek Dayk û Bab,
- Encamê Pişkinînê.

Razîbûn Derfetê didete Mamostayan jî û Kesên dî yên ji alyê Dibisanê ve Deng liser hatiye dan anjî ji aliyê wê ve hatine raspardin jibo birêvebirina Pişkinîna bixwe bi Rêka PoC – lidijî Cîna û bihevra derbas bikin û li Encamê Pişkinîna lidijî Cîna ya Kiça hewe / Kurê hewe, temaşe bikin û bidest bidine wan. Ew Encamên Erênî yên Pişkinîna lidijî Cîna ya bilez ya Kiça hewe / Kurê hewe, agehdarî Ofîsa berpirs ya Tendurustiyê biket (Biryara Wezareta Civakê, Tendurustiyê, Gencan, Xêzanê û Pîra di deqê hatiye Pejiranden ji (Biryar jibo gişt Kardana jibo Rêkxistin û Terxankirin (Cudakirin û Qarantînekirin) Jiber toşbûn bi Rengê nû yê Vayrosa Koronayê (SARS-CoV-2) yanjî rêzgirina wek Kesê 1 yê Peywendiya di Maleka guncayda”) eve dê xwecih mînît.

Zanyariyên dî jibo karkirin bi Zanyariyê Kesî:

Ev Zanyariyên girêdayn bi Kesî ve dê ji Aliyê wan Ciha ve hêne jêbirin ew Cihên kar liser kirîn, piştî bicih înanana Karê pêtivî-bi taybetî bidestve înanana cudakirinê li Dibistanê û dîrxistin ji çalakiyên Dibistanê herwesa Şikandina Zincîra toşbûnê-êdî pêwistî pê naket.

Kesê berpirsyar ji karkirina liser Zanyariya li Dibistanê, Rêvebera/ Rêveberê Dibistanêye, yên ko Kiça hewe /Kurê hewe lê di xwîne.

Senterê parastina Zanyariya yê wezareta Perwerdê ji bo Dibistanên giştî yê ko hatiye raspardin bi vî Karî: berêz Torsten Mai e, ew li jêr Têlefona: 0431-988-2452 û E-Mail:

DatenschutzbeauftragterSchule@bimi.landsh.de jibo peywendiya yê amadeye.

Wek Kesê peywendîdar piştî nîşandana mercên pêtivî hewe ev Mafên li jêrî hene: Mafê bidesxweve înanandina Zanyariya li dûf Madeya 15 ya parastina Nihîniya-Rêpênên Binyatî – DSGVO, Mafê Rastkirinê li dûf madeya 16 ya (parastina Nihîniya-Rêpênên Binyatî -DSGVO, Mafê Sirkirinê li dûf madeya 17 ya parastina Nihîniya-

Rêpênên binyatî-DSGVO, Mafê Sinordarkirina kar pê krinê li dûf Madeya 18 ya parastina Nihîniya- Rêpênên binyatî-DSGVO, Mafê Zêdekirina Zanyariya li dûf Madeya 20 ya parastina Nihîniya- Rêpênên binyatî-DSGVO, û Mafê Betalkirinê li dûf Madeya 21 ya parastina Nihîniya- Rêpênên binyatî-DSGVO.

Gazindêt peywendî bi karkirin liser Zanyariya heyn, hûn dikarin bo Sentirala parastina Zanyariya ya Raspardekirî ya Wezaretê Perwerde ya Dibistanên giştî yanjî bo Raspardê Herêmê jibo parastina Zanyariya ya serbixwe li Senterê Herêmê yê parastina Zanyariya, li Holstenstrasse 98, 24103 li Kiel, biken.

Eger Dibistanê haydarî liser encamê Pişkinîna Erênî ya Kiça hewe / Kurê hewe peyda kirin, dê wê/ wî jibo demekî, tako belgeyekê ne toşbûnê bi rêka encamekê Nerênî yê pişkinîna-PCR janjî bi Biryarek taybet ji alyê Ofîsa tendrustiyê janjî ji aliyê Cihekê guncay yê bispor berdest diken, ji Xandnê û ji Taqîkirina li Dibistanê bê behr keyn- jibo vê çendê Jivanekê vegerandinê yê hey, jibo ko da Diltena bîn ko Mamosta, Qutabî û Kesên dî toş nebin. Kiça hewe /Kurê hewe, piştî bidestxistina Zanyariya liser toşbûna wan ya Erênî li dûf pişkinîna lidijî Cîna, divêt demildest civata Qutabxanê bicih bihêlin. çavdêriya Perwerdeyî û hemahengî dê bo Kiça hewe /Kurê hewe hête berhev kirin. Digel Razîbûna hewe jibo pişkinîna bixweyî ya Kiça hewe /Kurê hewe bi rêka PoC-lidijî Cîna, hûn xwe berpirs diken ko Kiça xwe / Kurê xwe piştî pêgehiştina Zanyariya liser encamê pişkinîna Erênî ya lidijî Cîna bi rêka Qutabxanê, bilez li dûf pêçêbûna xwe ji Qutabxanê bihelînen yanjî bihête hilandin.

Em bi riya Têlefona jêrî, Têlefona Destî li demê Xandina Kiça me / Kurê me di berhevîn:

1. -----

2.

Destûrdan jibo karkirin liser Zanyariyên Kesayetî xwebexşe û herdem digel kartêkirina Demê dahatî beramberî Qutabxana Kiça me / Kurê me betal dikeyn. Tako betalkirinê ew Zanyariyên

hatîne wergirtin jibo kar liser kirinê û guhartina Zanyariya, dê mînît yasayî.

Ev Ronkirina Razîbûnê divêt ji herdu aliyê Dayk û Baban bihête îmzakirin, eger heye ko aliyek ji Dayk û Baban nûeratiya Zarokî bitinê biket, eger Mafê çavdêriyê êkla bikarbinît, yanjî Biryarê li dûf Madeya 1628 ji pertûka Yasaya Hewwelatiya liser bidet.

Herdemê Qutabiyek dijiyê xweda pêgehişt ew dikarit îmza xwe li dûf Madeya 6 birka 1 Rista 1 pîta a) herwesa madeya 9 birka 2 pîta a) ya parastina Nihîniya- Rêpênên binyatî-DSGVO, wekî liserî bi drêjahî hatiya diyarkirin liser karkirina Zanyariyên hewe janjî Zanyariyên wî yên Kesayetî biket û bihête belge kirin û pejirandina pêzanîna û gişt Têbîniyên dî yên vê Ronkirina Razîbûnê jibo birêvçûna Pişkinîna Bixwe bi Rêka PoC lidijî Cîna.

.....
Cih, Rêkeft

.....
îmza Dayk û Baba yanjî Qutabiyê
Jî Pêgehiştî